Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1230 | 15-Berfanbar-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Şahbanûya li ser text



Navenda Nûçeyan

**Li Panamarca ku li welatê Perûyê dimîne, odeyeke ku textê şahbanûyekê lê ye hate kifşkirin. Her wiha li ser dîwarên bi kerpîç gelek resmên ku çanda Moche temsîl dikin jî hatine dîtin. Ev resm û ode di derbarê hişmendiya zayendî ya heyî de kifşên nû ne ku berê li Perûyê nehatine dîtin.**

Lêkoler ango erkeologên Perûyê di lêkolînên xwe yên dawî de tiştekî nû kifş kirin. Wan li Newala Nepena ango Panamarca, li ser girekî odeyeke nû kifşk kir ku çanda Moche temsîl dike. Di odeyê de li ser dîwarên kerpîç resmên bi reng jî hatine çêkirin û her wiha textek heye ku dîsa çand û şaristaniya Moche nîşan dide. Ev text textê şahbanûyê temsîl dike. Xelkê Moche Piştî Mîladê di navbera sala 350 û 850'an de li Peruyê hikmê xwe kiribû. Di derbarê çand û jiyana şaristaniya Moche de di van salên dawî de gelek berhem hatine dîtin lê ev odeye nû ku weke text hatiye sêwirandin kifşeke nû û balkêş e di vî warî de.

Li Panamarca dîwarên bi resm cara ewil di sala 1950'î de têne dîtin. Çanda Moche bi menzereyên xewşik, mîmariyeke balkêş, hunereke kamil û nîgaşên olî pir dewlemend e. Li gorî ku lêkoleran ev resm an jî berhemên ku hatine dîtin; "Şeravan û rahîban temsîl dikin. Şerê di navbera insanan de. Her wiha mirovên ku du rûyên wan hene hatine teswîrkirin di van resman de. Wekî din fîgûrên cuda hene ku merasîmên Moche temsîl dikin." Lê ji xeynî van berheman odeyeke ku textê şahbanûyê lê dimîne cara ewil e li Panamarca tê dîtin. Beriya niha tiştekî bi vî rengî li Peruyê nehatiye kifşkirin.

**'Salona Xeyalî ya Moche'**

Ev kifşa nû ji hêla projeya "Menzereyên Arkeolojîk ên Panamarca" hatiye kirin ku ew ji sala 2018'an û vir ve li berhemên şaristaniyên beriya Kolomb dikolin. Arkeologên Perûyî û Emerîkî di vê projeyê de dixebitin. Odeya ku textê şahbanûyê lê ye li cihê ku jê re "Salona Xeyalî ya Moche" tê gotin hatiye dîtin. Textê ku li ser dîwarê kerpîç hatiye teswîrkirin ji çar sehneyan pêk tê. Di her sehneyê de jineke bê hêz hatiye teswîrkirin. Di resmên li ser dîwar de heyv, behr û mexlûqên ecêb hene. Her wiha fîgûrên ku hunera tevnsaziyê temsîl dikin jî hatine sêwirandin. Wekî din şahbanûyên ku li ser text rûniştine jî teswîrên xweşik ên li ser van dîwaran in.

**Hişmendiya zayendî ya heyî serobino dike**

Li Panamarcayê di demeke nêz de resmên ku jinên cuda yên bi karê tevnsaziyê re mijûl dibûn jî hatibûn dîtin. Ev jin li kargehekê bi karê tevnsaziyê re mijûl dibin. Li kêleka van resman merasîmên ku mêr tê de cih digirin û taca şahbanûyê jî li gelek deveran hatiye teswîrkirin. Lisa Trever ku niha li Zanîngeha Columbia weke profesorê hunera dîrokê kar dike di derbarê van kifşan de dibêje; "Panamarca dîsa weke her car me matmayî dihêle. Tenê behsa şêwekarên ku van resman li ser dîwaran xêz kirine nakim, berhemên antîk ên çanda Moche di derbarê rolên zayendî de jî hişmendiya me ya heyî serobino dike û tiştekî nû fêrî me dike."

**Mîtolojî an jî rastî?**

Lêkoler niha li ser odeya ku resm û text lê ne dixebitin û dixwazin tiştekî ji hev derbixin. Ji lewra ew hîna jî tênegihiştîne gelo ev fîgûr mîtolojîk in an jî şahbanûyên jidil in. Lê li gor rewşa fizîkî ya textê li odeyê hin nîşane hene ku ev text ji hêla şahbanûyên ji dil ve hatine bikaranîn. Ji lewma textê ku hatiye dîtin bi morîkan hatiye xemilandin û hin şopên din jî nîşan didin ku gelek carî şahbanû li ser text rûniştiye.

Niha kes nikare here van kifşên nû yên çand û hunera Moche bibîne. Yanî ev resmên li ser dîwaran hîna jî ji bo xelkê nehatine vekirin û ji bilî lêkoleran kes nikare wan bibîne. Jessica Ortiz Zevallos ku yek ji rêvebirên projeyê ye li ser vê yekê dibêje; "Heger ev resm bi awayekî baş neyên parastin ew ê ev resm jî eynî weke yên ku di sala 1950'î de hatibûn dîtin xera bibin û hilweşin."

# Çand û dîroka xwe diparêzin

**Huner di parastina çand û dîroka her neteweyekê de gelek girînge û hunera şêwekariyê jî weke beşeke girîng di hunera her neteweyekê de tê hesibandin. Jinên hunermend û şêwekar ên bajarokê Çemçemal ê parêzgeha Silêmaniyê, têkildarî rola jinan di parastina çand û dîroka gelê Kurd axivîn.**



Yek ji şêwekarên Çemçemalê Kazîwe Fatîh got:"Di karê hunerê de em jin hewl didin ku di xebatên xwe de mohra xwe diyar bikin. Ji ber ku girînge ku em bala xwe bidin pirsgirêkên navxweyî. Pirsgirêkên neteweyî jî ji bo me gelek giringe. Di paşerojê de wê projeyek me ji bo mijara Enfalê hebe û hemû tabloyên me wê li ser mijara Enfalê be ku mijarek netewî ye. Dema em karekê dikin yan dariştinek çêdikin, pêwîste destpêkê bifikirin ku morikek xwemalî di nav de hebe."

Hunermendek din a Çemçemalê Lane Fayeq jî li ser rola jinan a di parastina çand û hunera Kurdî de axivî:"Me çanda welatê xwe û bûyerên xwe yên dîrokî xêz kiriye. Lê dibe heta niha tabloyên me nehatibin pêşandan. Emê bi berdewam çanda welatê xwe xêz bikin û bi tabloyan nîşan bidin. Ji ber ku em hunermend in û karê me şêwekariye, em dixwazin tiştên ku di destên me de hene bi rêya tabloyan nîşan bidin û bigihînin welatiyan. Bi baweriya min çêkirina tabloyekê gelek tiştan nîşan dide. Ji bo wê em pirsgirêka xwe ya netewî û dîroka gelê xwe di tabloyekê de nîşan didin. Bi vî awayî hem ji bo ku çanda hunerê wek tabloyek bihêlin û hem jî ji bo gelê xwe nîşan bidin ku em xwedî dîrokin."

Di dewama axaftina xwe de Lane Fayeq qala bandora welatên biyanî kir û got:"Ji ber ku em hemû dizanin ku di her beşê civakê de welatên biyanî hene, heta di tabloyên me de jî. Gelek tabloyên me hene ku ji welatên biyanî hatine vir. Lê belê weke min û hevalên xwe yên di Komeleya Hunerên Bedew ya Çemçemal de, me ji ya welatê me zêdetir rê nedaye ku çanda tu welatekî têkeve tabloyên me. Ji ber ku reseniya me ya Kurdî pir xweş e, em dixwazin reseniya xwe nîşanî welatên biyanî bidin."

Sudoku: Bersiv 18

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 3 | 7 | 5 | 6 | 9 | 8 | 1 | 2 |
| 8 | 9 | 5 | 7 | 1 | 2 | 3 | 6 | 4 |
| 1 | 6 | 2 | 3 | 4 | 8 | 5 | 9 | 7 |
| 3 | 7 | 4 | 8 | 9 | 5 | 6 | 2 | 1 |
| 9 | 5 | 1 | 4 | 2 | 6 | 7 | 3 | 8 |
| 6 | 2 | 8 | 1 | 3 | 7 | 4 | 5 | 9 |
| 5 | 8 | 3 | 2 | 7 | 1 | 9 | 4 | 6 |
| 7 | 1 | 6 | 9 | 5 | 4 | 2 | 8 | 3 |
| 2 | 4 | 9 | 6 | 8 | 3 | 1 | 7 | 5 |

Sudoku:Pirs 19

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | | 5 |
| | | 9 | | | 2 | | 1 | 6 |
| 7 | | 5 | 4 | | | | | |
| | 5 | | | 7 | 1 | 2 | | |
| | | 7 | 6 | 2 | 5 | 3 | | |
| | | 1 | 8 | 9 | | | 5 | |
| | | | | | 3 | 1 | | 8 |
| 4 | 2 | | 1 | | | 9 | | |
| 9 | | | | | | | | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Bû bez û benîşt:**
- Belaya xwe ji min venekir; ji min neqeriya; dev ji min berneda; bi min ve zeliqî.

**Bûye mêşik maye bi pozê min ve:**
- Belaya xwe ji min venake.

**Bû teniya bidohn:**
- Belaya xwe ji min venekir; ji min neqeriya; dev ji min berneda; bi min ve zeliqî.

**Bû benîştê Ecem:**
- Bi heman wateyê.

**Bû qitika xwînê ket derê me:**
- Bi heman wateyê.

**Bû teniya sêlê/bû teniya berûşê:**
- Bi heman wateyê.

**Bûye cila şil ketiye stûyê me:**
- Bi heman wateyê.

**Bûye cirm ketiye derê me:**
- Bi heman wateyê.

**Bûye cirm ketiye stûyê min:**
- Bi heman wateyê.

**Bûye kevanokê riha min:**
- Ji bo kesên pir rikoyî tê gotin. (Kevan ji bo jenîna pembû bi kar tê; dema pembû bi tayê kevan ve dimîne zûbizû jê venabe)

**Bûye kevçikek xwîn ketiye pêşiya me:**
- Ji me re bûye bela; pirsgirêkan ji me re dertîne.

**Cila şil e, ketiye mil e:**
- Bûye bela; mirov nikare xwe jê rizgar bike.

**Çala bisinc e:**
- Bi heman wateyê.

**Çavê wan teng dike:**
- Bûye belaya serê wan; wan dixe tingiyê; ji wan re bûye pirsgirêk.

**Çermê serê min diqdiqand:**
- Di serê min de kir pitepit; ji ber axaftina wî serê min êşiya; bû belaya serê min.

**Çermê serê min xwar:**
- Bi heman wateyê.

**Darê xwe ji kunsêwê dernayne:**
- Li belayê digere; ew bi destê xwe pirsgirêkan ji xwe re dertîne.

**Darê xwe ji qula zirkitê dernayne:**
- Bi heman wateyê.

**Dema ecelê bizinê tê diçe nanê şivên dixwe:**
- Li belayê digere; ji xwe re nasekine; har bûye.

**Dema lêdana bizinê tê diçe nanê şivên dixwe:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Hêviya gelên Sûriyê welatekî federal û nenavendî ye'



Ezher Ehmed diyar kir ku hêviya gelên Sûriyê welatekî nenavendî û demokras e ku her kes tê de bibe xwedî maf û wiha bang kir: "Pêwîste hikumeta Demkî projeya Rêveberiya Xweser ji bo siberoja Sûriyê pêk bîne."**R-3**

## 'Doh li Şengalê îro jî li Rojava jin rastî tundiya DAIŞ'ê tên'

Hevseroka Rêveberiya Xweser a Şengalê Cîhan Celo diyar kir ku dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê doh li Şengalê îro jî li Rojavayê Kurdistanê tundiyê li dijî jinan dikin û qetlîaman li ser gelê kurd pêk tînin.**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1230 | 15-Berfanbar-2024 | www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S

## Ji çiraxên hunera kurdî



Hunermend Yasîn Botan kesayetekî hunerî yê navdar e. Şêwazê wî bi sadebûn û xweşbûna awazan diyar e, bi rêya van stranan, rewşa kurdî ya biêş dişopîne û gelek çîrok û serpêhatiyên kurdî di stranên xwe de zindî dike.**R-7**

## 'Tevî hemû zextan em dest ji doza xwe bernadin'



Welatiyên ku Şehba û Til Rifet ji ber êrîşên dagirkeriyê koçber bûne anîn ser ziman ku dema hatina herêma Rêveberiya Xweser ew rastî gelek tundî û zextên giran hatine û wiha gotin "Em welatê xwe ji bona dagirkeran nahêlin."**R-3**



**Dijminatiya Kurdan**
Ahmet Aktaş R-4

# NETEWEYA DEMOKRATÎK BINGEHA NÛAVAKIRINA SÛRIYÊ YE

Piştî rûxandina rejîma Baas di dîroka Sûriyê de rûpeleke nû dest pê kir. Xewina gelên Sûriyê avakirina Sûriyeke nû û demokratîke ku hemû pêkhate tê de bi azadî bijîn. Lê ji ber destwerdana hêzên derve ku dixwazin li Sûriyê berjewendiyên xwe pêk bînin, herwiha hewildana komên islamî yên radîkal ku dixwazin bibin desthilatdar, metirsiyeke mezin li ser siberoja Sûriyê çêbûye. Ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û dadmend tenê rêyek heye, ew jî pêkanîna pergala Neteweya Demokratîk e.**R-4**



## Metirsiya li ser jiyana mirovahiyê 'çeteyên dagirker'

Di nava 8 salên dawî li Sûriyê gelek komên çete bi nav, cil û berg, bîrdozî û formên cuda derketine holê. Lê belê ev hemû komên çete di dawiyê de li ser maseya hikûmeta AKP'ê û MHP'ê ya bi pêşengiya şêfê faşist Erdogan hatin cem hev.**R-5**



# Komeleya Lêlûn ji gelê Efrînê re bawerî ye

Komeleya Lêlûn a Qurbaniyan kiryarên hov ên ku li Efrînê têne kirin belge dike û ji bo doza Efrînê kar û xebatê dide meşandin. Yek ji damezrînerê Komeleya Lêlûn Demhat Ibrahîm da zanîn ku armanca wan bidawîkirina kiryarên dijmirovî û dadgehkirina sûcdara ne.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Di dirêjahiya salên şer ên Sûriyê de, herêma Efrînê di nava gefên hebûnî û binpêkirinên bêhejmar de jiyan kir. Piştî êrişa dagirkeriya Tirk Tirkiyê ya bi navê ku di sala 2018'an de pêk hat û kontrolkirina wê digel komên çete, ev bipêkirin bi awayekî sîstematîk û rêxistinî hatin meşandin. Li ser vê bingehê komek ji keç û xortên Efrînê, hezkiriyên axa û dilsozên zeytûnên wê, herwiha ji ber baweriya wan a bi dîroka bav û kalan, nirxdayîna ked û têkoşîna wan di parastina mirov, xak û daran de, pêwîstî bi avakirina komeleyekê ku rê li ber vegerandina mafan ji xwediyên wan re veke û ji bo dadmendiyê hewla xwe bike hebû, lewra Komeleyek bi nave Lêlûn dane avakirin. Lêlûn ji bo piştgiriya tevahî qurbaniyan, doza Efrînê, sererastkirina ziyayan, belgekirina tiştên ku li Efrînê pêk tê. Herwiha vegera hemû koçber û penaberan bo cihên xwe yên resen bi rêyekî ewle, rûmet û dilxwaz kar dike. Di heman demê de bi rêya şopandina êşên xelkê û belgekirina tevahî binpêkirinên derheqê wan de pêk tên û vegerandina mal û milkên xelkê jî kar dike. Lêlûn bi beşdariya sazî û rêxistinên herêmî û navnetewî kampaniyên piştgiriyê li dar dixe.

**Lêlûn ji bo qurbaniyên binpêkirinan dibe piştgir**

Komeleya Lêlûn komeleyeke nehikûmî, neqezenc û bêalî ye ku di 17 Adara 2023'an ji bo piştgiriya hemû qurbaniyan û pirsgirêka Efrînê ya li Sûriyê kar dike, hatiye damezrandin. Herwiha belgekirina binpêkirinên mirovan û meşandina kampaniyayên parêzvaniyê bi beşdariya sazî û rêxistinên cihêreng ên herêmî û navetewî jî di nav de. Di heman demê de Lêlûn kiryarên ku di derheqê niştiçih û gelê Efrînê de tê kirin, belge dike û ji qurbaniyên şer re pêşkêşkirina destkedayînê dike. Lêlûn hewl dide hişyarê ji koçberên ku bi darê zorê ji axa xwe derketine bike, da ku hemû mafên xwe bi riya dadgehê bides bixin. Name ji Komeleya Lêlûn ew e ku parastina mafên mirovan bike, bi taybet hemû kesên ku bûne qurbaniyên binpêkirinan li Efrîn û her cihê ku sûc lê tên kirin.

"Lêlûn" ji bo Efrînê sembol e û bi darên xwe yên zeytûnê navdar e, sedema navê Lêlûn ji komeleyê re ew e ku "Lêlûn" bi eslê xwe peyveke kurdî ye, tê wateya "mêweya zeytûnê berî gihîştina wê" di heman demê de "Lêlûn" navê çiyayekî ye dikeve ser bajarê Efrînê. Armanca Komeleya Lêlûn parastina mafên qurbaniyan û destekdayîna kesên ku ji ziyan dîtine.

**Kar û xebatên ku Komeleya Lêlûn dide meşandin wiha ne:**

-Amedkirina Raporên Nûçegihaniyê: Ev beş bi taybet li ser belavkirina nûçeyên bi belge û rasteqîn ên lezgîn kar dike.

- Amedekirina Raporên Mafnasîn: Lêhûrbûna raporan di warê dosya û rûdanên taybet, ev rapor jî bi belge û xwedî jêder in.

- Daxuyaniyên Çapemeniyê: Ev beş bi taybet li ser dayîna daxuyaniyan bi komeleyên xwecihî û herêmî.

- Çîrok û şahidên binpêkirinan: Ev beş çîrokên kesên ku rastî kiriyarên binpêkirinê hatine eşkere dike, mîna çîrokên kesên qirtî, koçber û yên rastî işkenceyê hatibûn.

-Dozdara eşkerekirina kiryarên binpêkirinê: Ew bi hevkariya rêxistinên Sûrî yên xwecihî û navneteweyî hewl dide ku bi pêngavan rabe ji bo eşkerekirina sûcên dijmirovî yên li herêmên dagirkirî têne kirin.

- Piştgiriya Qurbaniyan: Komeleya Lêlûnê bi rêyên cûda cûda piştgiriyê ji bo qurbaniyan dike.

- Avakirina Sîstema agahiyan: Komeleya Lêlûn hewla xwe dide ku sîstem û pergalekê çêbike, bi rêya wê binpêkirinan bi belge bike. Armanc jê bikaranîna van agahiyan ji bo eşkerekirina sûcên dijmirovî û cezakirina sûcdarên wê li ser asta xwecihî û navnetewî.

Derbarê avabûn, kar û xebatên Komeleya Lêlûn yek ji damezrînerê Komeleya Lêlûn a Qurbaniyan Demhat Ibrahîm ji rojnameya me re axivî. Demhat Ibrahîm diyar kir ku Lêlûn kirayrên li Efrînê tê kirin belge dike, rastiya dagirkeriyê eşkere dike û wiha got: "Hin ji damezrînerên Lêlûn ji qurbaniya ne ku di destpêka dagirkirina Efrînê ji aliyên çeteyan ve hatibûn girtin, an jî bi darê zorê koçber bûne, lewra wan xwest dengê xwe bighînin rêxistinên navnetewî, da ku ji wan re diyar bikin çi di hundirê Efrînê de tê qewmandin. Hizra avakirina Komeleya Lêlûn ew e ku kiryarên di hundir Efrînê de tê kirin belge dike, hem rastiya çeteyan a ku sûcên dijmirovî di derheqê jin, zarok, mêr, dar û xwezayê bi giştî eşkere dike. Di demê ku Lêlûn hatiye damezrandin û heya niha bi raporên babetî kiryarên di hundirê Efrînê tê kirin belge dike. Çavkaniyên Lêlûn di hundirê Efrînê de hene, bi wan re rojane danûstendin tê kitin, ji bo sûcên li Efrînê pêk tên eşeker bikin, ev yek bi riya lêkolînvanên meydanî ye. Em zanyariyên derbarê Efrînê li ser internêtê parve dikin, hin jî bi rêxtinên navnetewî weke Hiyomên Raytsoş, Komîteya destûriye Ewropiye, komîteya lêkolînên navteweyî têkildarî Sûriyê ye, van zanyariyan bi rengekî fermî ji wan re eşkere dikin, ew jî xwespêrandina xwe li ser Lêlûn dikin. Zanyariyên me jî xwe dispêrin li ser dîrok, roj û kesên ku kiryar pêk anîne kîne.

**'Gelê li Efrînê dimîne nikare bi vesînê deng bike'**

Demhat Ibrahîm da zanîn ku Komeleya Lêlûn li kêlek derxistina kiryarên ku li Efrînê tê kirin, perwerdeyên piştgiriya derûnî ji koçberan re dide û wiha got: "Armaca Lêlûn li kêlek derxistina kiryaran û belgekirina wan, hin perwerde ji bo avakirina xwestek û îadeya qurbaniyan ji karkirinê re pêk anîn, him jî çend



rûniştandinên piştgiriya derûnî ji kesên temen mezin û ciwanan re pêk anîn. Di heman demê de Lêlûn çend komxebat derbarê astengiyên koçberan, jî lidar xistin, di wan komxebatan de hin ji nûnerên rêxstinan û Rêveberiya Xweser beşdar bûn û li wan astengiyan guhdar kirin û hewldanên çareseriyê ji wan re dîtin. Lê gelek astengî li pêşberî kar û xebatên me derdikevin, ji ber kesên ku têkiliyên bi me re dikin, carnan internêt li cem wan peyda nabe, yan çeteyên li Efrînê telîfonan kontirol dikin. Gelê li Efrînê dimîne, nikare bi vesînê deng bike."

**'Efrîn doza Kurdisatanî ye'**

Demhat Ibrahîm axaftina xwe wiha qedand: "Komeleya Lêlûnê sal û nîvekê bê dirav kar û xebat ji bo derxistina kiryarên dijmirovî ku di derheqê gelê Efrînê tê kirin da meşandin. Efrîn doza her kesî ye û ya Kurdisatanî ye. Komeleya Lêlûn ji gelê Efrînê re baweriy e. Em dixwazin dadgehekê ji kesên ku gel dike qurbanî pêk bînin. Herwiha hêviya me kiryar bidawî bibin û her kesê destê wan di sûcan de hene, bêne dadgehkirin."

# Armanca Navenda Nînîhorsax alîkariyên mirovî ye

**Dîlan Mulhim/ Qamişlo**

**Bijîşkên Navenda Nînîhorsax ya Tedawiya Xwezayî diyar kirin ku ew hewil didin ku bi rêya tedawiya xwezayî ji nexweşiyên welatiyan re bibin çareserî û gotin; "Armanca me ya sereke alîkariya mirovî ye."**

Ji kevnariya jiyanê ve her dem ên ku bi xwezayê re eleqedar dibin jin in. Bi destên jinan tov û xweza hatin kişifkirin û bi demê re ji xwezayê derman hatin çêkirin. Jinan bi destên xwe nexweşî derman dikirin. Ev taybetmendiya jinê ye ku heta niha jî derdikeve holê û dermanên xwezayî çêdikin û derdora xwe tedawî dikin. Li ser vê bingê jinan bi derfetên xwe ji bo pêşxistina tedawiya xwezayî di sala 2022'an de Navenda Nînîhorsax ya Tedawiya Xwezayê li bajarê Qamişlo vekirin.

Di derbarê kar û xebatên Navenada Nînîhorsax de, bijîşkên tedawiyê piskolojî û fîzkiya laş, Kîfai Zerah û Cîhad Hisên ji rojnameya me re axivîn.



Kîfai Zehaf



Cîhad Hisên

**Kar û xebatên navenda Nînîhorsax**

Kîfai Zerah di destpêka axaftina xwe de behsa destpêka avakirina navêndê kir û wiha got: "Karê navenda Nînîhorsax bi tevahî girêdayî beşa fîzîkî, , piskolojî û tedawiya bi enerjiyê ye. Di heman demê em bi rêya giya û rûnên xwezayî tedawiya nexweşiyan dikin. Ev rûn em li ser destên xwe çêdikin. Herwiha gelek cureyên rûn hene em biriya keldûmanê bi dest dixin. Hin giyayan jî em bi rêya makîneyên hûrkirinê amade dikin. Di heman demê de em ji tovên reşreşk, zencebîl, helbê û hwd rûnan derdixin. Em li kêleka karê xwe perwerdeya tedawiya xwezayî jî ji bo welatiyan didin, bi taybet tedawiya piskolojî û hevsengiya laş em didin. Ev perwerde jî karekî xwebexşe û ji bo alîkariya welatiyan e."

**'Em li gor derfetên xwe bi welatiyan re dibin alîkar'**

Kîfai Zerah anî ziman ku tedawiyên fîzîk ji bo welatiyan hefteyê carekê tê kirin û wiha domand: "Kesê nexwş ji vê perwerdeya tedawiya fîzîk fêrî werzîşa yoga dibin. Ev werzîş tenduristiya mirov li pêş dixe. Dema ku mirov fêrî vê perwerdeyê dibe, mirov hêz dike ku ku ew kesekî çalak. Di vê demê de em gelekî li ser ciwanan disekin bi taybet ji aliyê piskolojîk ve. Ji ber ku di vê demê de gelek guhertin di fikir û ramanê nifşê nû de çêbûye, ev zanist dibe alîkar ku piskolojiya mirov ji van rewşên heyî yên zehmet reht bike. Herwiha em bê dirav mirovan tedawî dikin, ez bijîşka yekemîn im ku di Rojavayê Kurdistanê de vî karî dikim.

**Sûndgirtina mirovan ji dermanên xwezayî re**

Di heman çarçoveyê de Cîhad Hisên jî wiha got: "Karê min ê tedawiya fîzîkî ya ji bo laşê mirove. Di qada fîzîkiya laş de em mesajê ji mirovan re çêdikim. Çanda mesajê li Rojava pir kême. Mesaj ji bo tendurstiya mirov gelekî baş ji ber ku enerjî li cem laşê mirov çêdike. Di heman demê de sê cureyên mesajê hene, lê mesaja ku em ji bo nexwşan çêdikin, mesaja tedawî û rihetkirina laş e. Li aliyekî din jî em gelek giyayan li ser destê xwe ji bo mirovan çêdikin. Ev giya ji dermanên kîmyayî ku bijîşik û dermanxane didin mirovan, bisûdtire. Ji ber ku dermanên ku em çêdikin dermanekî xwezayî ye. Îasl gelek mirovan ev derman birin û gelekî sûd ji dermanan girtin."

**'Armanca me vegera li koka bijîşkê ye'**

Bijîşkê tedawiya fîzîkî Cîhad Hisên axaftina xwe wiha bi dawî kir:" Her care ku nexweş tê li cem me ji bo mesajê, rûnştandinek du seatan berdewam dike, bi 50 hezar lîreyê Sûrî ye. Lê dema ku kesek rewşa wî ya madî nebaş em dibin alîkar pêre, ji şûna 50î'hezarî em 30'hezarî ji wan distînin. Armanca me ji vê navendê ne qezenckirina madî ye , lê alîkariya mirovane û em koka bijîşkî derdixin."



# 'Hêviya gelên Sûriyê welatekî federal û nenavendî ye'

Ezher Ehmed diyar kir ku hêviya gelên Sûriyê welatekî nenavendî û demokras e ku her kes tê de bibe xwedî maf û wiha bang kir: "Pêwîste hikumeta Demkî projeya Rêveberiya Xweser ji bo siberoja Sûriyê pêk bîne."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Geşedanên ku li Sûriyê diqewimin, piranî bi pilanên dewletên navnetewî ne û hemû hêzên herêmî û xwecihî rewşa Sûriyê dişopînin. Derbarê heman mijarê jî endamê Desteya Navendî ya Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê Ezher Ehmed bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

**Piştî ketina rêjîma Baasê wê rewşa Sûriyê ber bi ku ve biçe û sînariyoyên muhtemel çi ne?**

Piştî dîrokeke dirêj ji zilm û zordariya ku rêjîma Baasê li ser gelên Sûriyê bi taybet gelê kurd dimeşand, ev rêjîm hilweşiya. Rêjîmeke ku li ser xwîna gelan bi hişmendiya yek netew û yek zimanî hatibû avakirin. Vê rêjîmê siyaseteke desthilatdar dimeşand û neteweke din qebûl nedikir. Lewma piştî ewqas zordariyê dilê gelên wê bû mîna volkanekê û bi desthilatdariya wî de teqiya. Ev bi xwe sînariyoyeke dîrokî bû, ketina rêjîma Beşar Elessed ji bo Sûriyê destpêka rojeke nû bû. Lê îro wê Sûriyê derbasî sînaroyêyên nû ji bo pêşerojê bibe. Eger hikumeta Demkî ya ku rêberiya operasyonan bi pêşengtiya Heyet Tehrîr Elşam dest pê kir, li ser bingehê welatekî fedral û nenavendî ava bibe wê sînariyoyên baş di siberojê de pêk werin. Bêguman eger mafê hemû pêkhateyan bi hemû baweriyan paşguh nebe di destûrê Sûriyaya pêşerojê de, wê siberojeke li ser bingeha wekheviyê were avakirin. Hem jî hikumeta ku were avakirin bi rihê berpirsiyariyê li mafê pêkhateyan binêre û dûrî radîkaliyetê bikeve wê heviyeke me ji bo Sûriyeke demokrat çêbibe. Lê eger hikumeteke xwedî sîstemeke radîkal, dûrî diyalog û fediraliyetê ava bibe wê Sûriyê parçe bibe. Di encamê de wê şerê navxweyî di navbera gelên Sûriyê de çêbibe û wê Sûriyê derbasî şerekî mayînde bibe. Di heman demê de wê Sûriyê bikeve bin desthilatdariya hêzên herêmî û navnetewî, di serî de dewleta Tirk a dagirker. Em dizanin ku dagirkeriya Tirk çavê wê li xaka Sûriyê ye û pêkanîna pilana Mîsaqa Millî ye.

**Bi têkçûna rêjîmê û pêşveçûna Tehrîr Elşam re, li Sûriyê gelek valahî çêbû, li hemberî vê valahiyê pêwîste çi were kirin?**

Hemû deverên ku di bin serweriya hikumeta Şamê ya hate hilweşandin de bûn, di roja îro de vala bûne metirsî ji vejînkirina çeteyên DAIŞ'ê heye. Herwiha metirsî heye ku komên radîkal ên Islamî li wan deveran bikevin tevgerê. Ji ber ku berî niha ev yek çêbûye. Dema ku hikumeta Şamê bêhêz dibû û serweriya wê li hin deverên li Başûrê Sûriyê nedima, derfeta çeteyên DAIŞ'ê çêdibû ku tevgera xwe zêde bikin. Li aliyekî din jî dewleta Tirk dixwaze sûdê ji vê valahiyê werbigire û axa Sûriyê dagir bik. Me dît ku çawa dewleta Tirk û çeteyên wê, êrişî xetên şer yên weke Bab, Minbic û Til Rifeetê kir. Ev yek jî ji encama tevlîheviya ku li Sûriyê pêk hat, êdî derfeta pêkanîna berjewendiyên dagirkeriya Tirk ên Osmanî ji bo Sûriyê çêbû. Da ku ev valahî were dagirtin û tevlîhevî bi dawî bibe, pêwîste rewş bikeve bin kontrolê. Tişta tê xwestin di dema heyî de ew ku hikumeta Demkî bi awayekî aqlane nêzî hêzên xwedî rol bibe. Mînaka herî guncav jî hêzên QSD'ê ye. Lewma jî divê danûstandinên cidî di navabera Rêveberiya Xweser û hikumeta Demkî de çêbibe.

**Piştî van geşdanên dawî wê rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê çawa be û ji bo pêşeroja Sûriyê pêwîste sîstemeke bi çi rengî were avakirin?**

Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji hemû waran ve bi rêxistinkirî ye, çi hêla aborî, siyasî, leşkerî û hwd… ve an jî hêla zagonî û rêveberinê ve be. Ev herêm xwedî sîstemeke fedralî- nenavendî ye û hemû pêkhate bi ol, çand û baweriya xwe dijîn û metirsî di warê rêvebirina wê de tune ye. Lê belê metirsî ji êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê heye. Niha dewleta Tirk a dagirker û komên wê yên çete hewl didin herêma Minbic û Til Rifeetê dagir bikin. Di roja heyî de gef li ser herêma me tên kirin ji hêla van komên tundrew. Em dibînin ku li herêmên dagirkirî û deverên ku



şer lê rû dide, komkujî di derheqê sivîlan de tên kirin. Di encama êrişên dagirkeriyê de jî jin û zarok guhertina demografî û destdirêjî li jinan û termên sivîlan çêdibe. Lê em di wê baweriyê de ne ku wê civaka navnetewî destekê bide Rêveberiya Xweser û li hemberî komên çete û dagirkeriya Tirk bisekine. Li aliyekî din jî em dinerin ku rewşa herêman li gorî sînorên xwezayî bimeşe û wê komên çete nikaribin wan vî sînorî derbas bikin. Sûriyê di roja heyî de li benda hikumeteke nenavendî- federal û demokrasî ye. Lewma jî pêwîste ku ev hikumeta demkî sûdê ji proje û sîstema Rêveberiya Xweser bigire. Rêveberiya Xweser ji bo hevkariya avakirina Sûriyeke nû û demokrat re amade ye û fermandarê Giştî yê QSD'ê diyar kir ku ew amade ne ji bo diyalogê.

# 'Tevî hemû zextan em dest ji doza xwe bernadin'

**Navenda Nûçeyan**

**Welatiyên ku Şehba û Til Rifet ji ber êrîşên dagirkeriyê koçber bûne anîn ser ziman ku dema hatina herêmên Rêveberiya Xweser ew rastî gelek tundî û zextên giran hatine û wiha gotin "Em welatê xwe ji bona dagirkeran nahêlin."**

Piştî têkçûna rêjîma Bass li gundewarên Idilb û kontrolkirina HTŞ'ê ji piraniya bajarê Helebê û derdora wê re, çeteyên dewleta Tirk a dagirker êrişeke mezin birin ser Şehba û Til Rifetê, di encamê de bi 10 hezaran koçberên Efrînê ku piştî dagirkirina Efrînê di sala 2018'an de li Şehbayê bicih bibûn, careke din koçberî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Di riya koçberiyê de gelek koçber ji aliyê çeteyên dewleta Tirk a dagirker ve rastî tundî, işkence, revandin û kuştinê hatin.

Derheqê kiryarên çeteyên dewleta Tirk a dagirker, koçberên herêma Şehba û Efrînê ji rojnameya me re axivîn.

**'Çeteyên dagirker, gelek kiryarên dijmirovî li pêş çavên me pêk anîn'**

Koçbera bi navê Fikret Ebdo Xelîl bibîrxist ku ew bûye şahida êrîş û



Fikret Ebdo Xelil



Idris Mihemed Hisên



Cangin Nurî Hemdan

gelek kirayrên dijmirovî yên çeteyên dagirkeriya Tirk û wiha got: "Em ji navçeya bajarê Efrînê Şêrawa ne. Piştî dagirkirina Efrînê em derbasî kampa Serdem ya li Şehba bûn. Ev 7 sal bûn, me li wê derê jiyana xwe didomand. Êrişên ku li ser herêmên me çêbûn agahiya ti kesî jê nebû. Me tu carî bawer nedikir ku em rojekê ji Şehba jî koçber bibin. Lê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê hebûna Kurdan napejirînin. Berxwedaniyek pir mezin li bajarên Efrînê hat meşandin ji ber wê ye, gelên li wê derê hertim bin gefa dagirkeriyê dey e. Ev berxwedaniya xwe derbasî kampa Serden jî hatkirin. Em 30'ê Mijdara 2024'an Şehba koçber bûn, 1'ê mehê hatin Helebê û kiryarên çeteyen we rû bi rû hatin hiştin. Em wî serdema zivistanê heya şew em piranî di zarok û jinê ducanî ji derve man. Dema êrîş pêkhat em merasîma cangoriya da bûn. Gelek welatiyan nekarin zarokên xwe xelas bikin. Çeteyên dagirker hatin ketin dinav gel de û gef me xwarin. Gelek jin rastiyê tecavûzê hatin. Çeteyên HTŞ'ê şerê derûnî didan meşandin raste rast kiryarên fizikî ne di meşandin. Çeteyên girêdayi dewleta Tirk ya dagirker kiryarên dij-mirovî pêkanin. Çeteyên tirk taybet hatibûn hilbijartin ji ber gelên herêmê bitirse û biçe Efrînê. Em bûn şahîdê çend bûyerên dilêş. Du jinên sivîl destpekê rastî tundiyê hatin piştra ev qetilkirin û destdirêjî li cenazeyên wan jinan hat kirin. Welatiyên bi navê bavê Mazlûm kurê wî di nava refên Tevgera Azadiyê şehid bibû gulebaran kirin û şehîd xistin. Dîsa welatparêzê bi navê Murşîd Ebdo jî, ji bona nekeve destê çeteyen xwe şehîd xist. Me wek gelê Efrinê çend caran em ji ber dagirkeriyê koçber dibin. Lê bila dijmin wê tiştê baş bizanibe ti cara bi van kiryaran nikarin serê me bidin tewandin. Emê hertim bi rihê gelê şoreşgerî berxwe bidin û li gel hêzên xwe bicih bigirin."

**'Bi navê Tevgera Azadiyê gef me dixwarin'**

Koçberê bi navê Idrîs Mihemed Hisên da xuyakirin ku tûndiya derûnî di aliyê çeteyên dagirkeriya Tirk li ser malbata wî hatiye meşandin wiha got: "Em ji Efrînê gûndê Basutê ne. Demê êrişan em Til Rifat bûn. Demê êrişan da em li mal bûn derdorê me gulebaran kirin. Zarokên me tirsiyan. Çeteyan digotin emê we qirkirinê re derbas bikin. Em wek malbat roja yekem de Til Rifet derketin. Em Şehba hatin di aliyê Ehrez de, çeteyan bi erebeyên çekên giran pêşîya me qutkirin. Ne hiştin em di heman rojê de derbasî herêmên Rêveberiya Xweser bibin. Demên siharê çeteyên navçav girtî derbasî nava girseya koçberan bûn. Me bi çavê xwe alên DAIŞ'ê li ser mile çeteyên girêdayi dewleta Tirk dîtin û gef me xwarin. Kirasên dirêj li ber wan de hebûn. Ev dide xuyakirin ku dewleta Tirk dîsa hewildide DAIŞ'ê li herêmê serwer bike. Çeteyan di gotin 'Em xwe nêzî leşkerên rejîma BAAS'ê nabin û yên girêdayi tevgerên din jî.' Mebesta wan xebatkarên Tevgera Azadiyê û gelê Kurd yên welatparêz bûn. Heya em gihiştin herêmên bi ewle malbatamin metirsiyek mezin jiyan kir."

**'Di xeyalên me de, hertim li wegera Efrînê heye'**

Koçberê bi navê Cangîn Nurî Hemedan hêstên xwe yên êrîşa bi wiha da xuyakirin: "Em piştî dagirkirina Efrînê derbasî Şehbayê bûn. Piştî êrîşa em derbasî herêmên bi ewle hatinkirin. Dema em derbasî herêmên Reveberiya Xweser bûn min jî di gelek bûyerên zehmet jiyan kirin. Li pêşîya çawê min welatî hatin serjê kirin. Bi rastî kêliyên bieş bûn. Em hertim bi xeyalên wegera Efrînê jiyan dikim û hatina me ya konên Serdem jî, ji ber wan xeyalan bûn. Lê hertim em bi êrîş û dagirkeriyê rû bi rû ne. Bi rastî ji, piştî em derbasî herêmên Rêvebriya xweser bun xebatkarên Rêveberiyê di nav tevgerê dan e. Xebatkarên Rêveberiya Xweser ji bona em jiyaneke bi ewle jiyan bikin kar û xebatên xwe nadin sekinandin. Emê hertim berxwe bidin rê nadin dagirkeran."

# ‘Rêveberiya Xweser bingeha avakirina Sûryeke Demokratîk e’

Siyasetmedar û hevserokê berê yê Desteya Peywendiyên Derve yê Rêveberiya Xweser Bedran Çiya Kurd da zanîn ku eger di avabûna Sûriyêkê nû de kurd nebin, pêşiya aloziyan nayê girtin û wiha got “Gelê Kurd hêzeke mezin di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ye, çareseriya Sûriyê tênê bi modela Netewa Demokratîk pêkan e.”

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

50 salin gelên Sûriyê ji sîstema yekpartî ya Bass ziyaneke mezin dît. Rejîma Bass’ê ti caran ne dixwest nêrînên gel guhdar bike. Herwiha nedixwest gel bifikire û xwe rêxistin bike. Kesên xwedî raman û rêxistinbûyî ji bo pergala xwe xeternak di dîtin. Ji ber wê hişmendiya xwe ya netewperestiyê desthilatiya rejima Bassê ya ku di aliyê Beşar Esed ve dihate rêvebirin hilweşiya. Di aliyên komên çete yên girêdayi dewleta Tirk û komên bi navê HTŞê yên isalmî radîkal fikarek li cem gelên herêmê dihêl e. Gelo dê bikarin bê gelê Kurd Sûriyek nû avabikin? Rêveberiya Xweser ji bona di pêşeroja Sûriyê de mafê gel biparêze xebatên girîng dide meşandin.
Derheqê geşedanên ku li Sûriyê rû didin, herwiha avakirina siberoja Sûriyê û pêşdîtinên pêvajoyê, siyasetmedar û hevserokê berê yê Desteya Peywendiyên derve yê Rêveberiya Xweser yê berê Bedran Çiya Kurd ji rojnameya me re axivî.

**‘Rejîma Bass netewa Kurd ti caran nedipejirand ji ber wê hilweşiya’**

Bedran Çiya Kurd anî ser ziman ku demê Rejîma Baasê gelê Kurd û pêkhatayên derveyî netewa Ereb rastî gelek kiryarên xêrab dihatin û wisa dest bi axaftina xwe kir: “Rejîma Beşar Esed ji ber zilm û yekdestdariya salan hilweşiya, wek ku me her tim li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dinirxand: Nexwendina rastiya Sûriyê û fêmnekirina vê rejîmê bi dehê salan maf û daxwazên gelê Sûriyê înkar kir. Ev êrişên çeteyan dawiyê li ser gelê me pek hatin jî da xuyakirin ku dewleta Tirk ya dagirker dema mijar dibe Kurd çeteyên DAIŞ’ê re hevkariyê dik e. Çeteyan Helebê, Til Rifet, Şehba û herî dawî jî, ji Minbic dagirkirin û kiryarên gelek kirêt li ser gelê me meşandin. Hêzên girêdayi Rejima Bass’ê bê ku berxwe bidin çeperên xwe berdan û gelê Sûriyê qirkirinê we rû bi rû hiştin. Çeteyan ku dîtin berxwedanî nine berê xwe dan paytexta Şam ê. Niha ne xuya ye rewşa gel dê çi bibe. Em pêşaroja gelên Sûriyê jiyan dikin ti cara ji dagirker û metingeran re nahêlin. Pêwîste li welatê xwe bi rûmet bijîn. Cihan giştî wê tiştê agahdar e ku bê gelê Kurd çareserî Sûriyê nabe. Ristek mezin ya gelê Kurd û Reveberiya Xweser Sûriyê de heye. Ti kes nikare wê rastiyê inkar bike. Gelê Kurd yên ku axa Sûriyê jiyan dikin, beriya 2011’an bê nasname û bê maf hatibû hiştin. Niha jî ger çareserî tê xwastin pêwiste gelê Kurd muxateb bê girtin. Em jî wek Rêveberiya Xweser her tim din ava tevgerekê debin ku em bikaribin nunertiya gelê xwe baş bikin.”




**‘Pêwiste em yêkitiya xwe ava bikin, ji bo ku em mafê xwe dest bixin’**

Çiya Kurd balkişand li ser yekîtiya gelên Sûriyê û wisa axaftina xwe domand: “Gelê Kurd em bi hêvîne rihê li hemberî dagirkeran dema ku 2004’an didan xuyakirin, niha ji wê demê xurttir bikin. Dem dema yêkrêzî û hevgirtineke xurtt e. Ji ber ku bi hewcedariya çareserkirinê, li vî welatî qala edalet û demokrasiyê nayê kirin. Bi hêzên çekdarî yên weke komên çekdar girêdayî HTŞ û çeteyên girêdayi dewleta Tirk ya dagirker rêvebirina Sûriyê de ne xwedî hêzin. Komên çete ne û di aliyê AKP-MHP’ê Ve tên rêvebirin. Ev raste rast dijminahiya gelê Kurd dikin û bajarên dagirkirî de mal û erdên Kurdan dagir dikin. Ji ber vê yekê jî Kurd bingeha pêkanîna aramiyê li Sûriyê û bingeha demokratîkbûna dewleta nû ya Sûriyê ne. Îro em rûbirûyê qonaxeke dîrokî ya girîng in li Sûriyê, ew qonaxeke metirsîdar e, ji ber ku dê bi salan bingeh û cudahiyê di jiyana xelkê Sûriyê de ava bike. Gelê Sûriyê bi pirrengî û taybetmendiya xwe ve û bi çandên cûda mînaka paradigmaya Netewên Demokratîk e. Sîyaseta ku berjewendiyên gelê Sûriyê bingeh negire em wê yekê napejirînin û heta niqaşan jî li ser nakin. Ji ber Rêveberiya Xweser modela gel e.”

**‘Pêşeroja Suriyê dê bibe nexşerêya Rojhilata Navîn’**

Çiya Kurd bibîrxist ku dibe ji nûve avakirina Suriyê de ristek mezin dikeve li ser milê Rêveberiya Xweser û axaftina xwe wiha qedand: “Ji bo Rêveberiya Xweser, rêveberî projeyek niştimanî ya Sûriyê ye, ku piştî têkçûna hemû hewldanên ku ji bo Sûriyê dihatin kirin, li ser wê bingehê Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dê bibe ya revebiriya tevahî gelên Sûriyê û Rojhilata Navîn. Damezirandina Rêveberiya Xweser ji bona aramiya Sûriyê ye. Projeya rêveberiyê di parastina yekîtiya Sûriyê û yekîtiya pêkhateyên Sûrî pêk bîne û nûnertiya gelên Sûriyê di asta cîhanê de bimeşîn e.
Em hêvîdar in ku Sûriyeya dahatî bibe Sûriyeke demokrasî, dadmendî û wekheviyê û li gorî hemû kevneşopî, têgeh û çanda Sûriyê be û hemû gelên Sûriyê bê cudahî di nava xwe de bihewîne. Gavekê ber bi çareseriyek demokratîk û ziyanên ku Sûriyê hatin avakirin holê rakirin e. Bidestxistina aşitiyê û destpêkirina vegerandina hêza xwerêvebirin û parastinê de Sûriyê weke welatekî bihêz cih û dewlemendiya xwe ya aborî ve rêvebibe. Li ser wê bingehê berxwedaniya gelên Sûriyê silav dikin û soza xebata gel û Rêveberiya Xweser bi hevre didin.”





## Dijminatiya Kurdan

**Ahmet Aktaş**

Di serî de dewleta tirk û hinek hevalbendên wê, gelo çima ewqas dijwar dijminatiya gelê Kurd dikin? Mirov bala xwe dide dîrokê, erê dijminatî pir in û ji aliyê gelek dewletan an hêzên desthilat ve, zulum û qirkerin hatiye serê pir gelan.
Lê qasî tê dîtin, ti dijminatiya ji ya desthilatên Tirkan mezintir nîne.
Erê, desthilatên vê dewletê, ne tinê di vê sedsalê de û ne tinê li dijî Kurdan, belê li dijî gelên Kurdistanê, gelên herêmê, pir gelên Ewrupayê û yên cîhanê jî, her cûre şêwazên kotekî yên dijî mirovahiyê bikar anîne. Herwiha ev zihniyet taybetî dujminê jinê, ekolojî û xwezayê jî.
Îca ev êrişkarî û zihniyeta dijî mirovahiyê ji kuderê tê, çavkaniyên wê çine(?), divê were zanîn.
Herwiha divê ev mijar bikeve rojevên Enstituyan, Akademiyan, Universitan û rewşenbîrên bi ûjdan, divê li ser vê nexweşiyê lêkolinê bikin, bi bingehîn were nas kirin û ji kok ve, mîna penceşêr an virûsên din ên pandemî werin çareser kirin.
Nexweşiyek civakî heye bi navê Sadizm(hezkirina ji kuştina mirovan), lê ez bawer dikim nexeşiya desthilatên tirk, ji vê jî mezintir û navekî nuh ê postmodernîzmê jê re lazim e!
Hema em, ji dîrokê yekser derbasî siyaset, hilwest û kiryarên vê dewleta nuha ya tirk a di bin desthilatiya Receb Erdogan û Devlet Bahçelî bibin.
Van diktatorên faşist, bi sedan caran bi gotinên û kiryarên xwe dujminatiya xwe ya beramberî gelê Kurdistanê nîşan dane û nuha jî her heman hilwestê û siyasetê didin meşandin.
Lê tu bala xwe didê, weke ku qet ew gotinên dijminkarane û ew kiryarên qirkerane ji wan nehatibe bihîstin, bê eyb û şerm dikarin derkevin li çavên gelên Kurdistanê û mirovahiyê binêrin û bêjin, “em dost û birayên gelê Kurd in, em aştîxwazin û dîroka me jî nîşaneyê ewqas qenciyên mirovahiyê ne û hwd.”
Hema, em deverên din bidin rexekê û em yekser bala xwe bidin gotin û kiryarên wan ên li Rojava, yên vê dawiyê.
Ji hilweşandina pergala Beşar Essed, xwe bêşdar dibîne û ji vê bûyerê sûd digrin û hîn dijwartir û xedartir êrîşî ser deskeftiyên gelê me, Şoreşa Rojava dikin.
Erê yên Beşar şikandin, Netanyahu û Erdogan e; Netanyahu yekser bi hêza dewleta xwe êrîş kir, lê Erdogan ne yekser bi navê hêza dewleta xwe, belê bi pêşengiya navê Mihemmed Colaniyê HTŞî, li gel çeteyên/kirêkirên wekîlên xwe Arteşa Netewiya Sûriyê û hinek komên din ên cîhadistên xwînrij û talanker êrîş kir.
Belê ev êrîşa ser pergala Beşar, bi plangeriya Ingilistanê, DYEyê û hevalbendên xwe pêkhat.
Netanyahû û Receb, bi tinê organizatorên kiryarî bûn.
Erê mijara ji bo me giring û balkêş ev bû ku, Colanî bi komên xwe ve êrîş birin ser sazî û hêzên dewletê, lê komên talanker, diz, kujer ên kirêgirên Erdogan, berê êrîşên xwe dan ser gelê Kurdistanê û destekftiyên Şoreşa wan û hîn jî dewam dike.
Li vira jî, dîsa zihniyeta dijminkarane ya Tirk derket pêş.
Dîsa baweriya bixwe û bi gelê xwe bû para me; û ji me re “serîtewandin diçe xiyanetê, berxwedan diçe serkeftinê” derket pêş.



# Metirsiya li ser jiyana mirovahiyê ‘çeteyên dagirker’

Di nava 8 salên dawî li Sûriyê gelek komên çete bi nav, cil û berg, bîrdozî û formên cuda derketine holê. Lê belê ev hemû komên çete di dawiyê de li ser maseya hikûmeta AKP’ê û MHP’ê ya bi pêşengiya şêfê faşîst Erdogan hatin cem hev.

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Erdogan ku piştgriya çeteyên dagirker kir, komên çete anîn Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê da ku xeyalên xwe yên avakirina Împaratoriya Osmanî pêk bînin. Ev komên çete di gelek caran êrîşên dagirkeriyê ya li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê de cih girtine û gelek kiryarên dijmirovî pêkanine. Ev komên çete di aliyê aborî de, bi destê dewleta Tirk ya dagirker ve tê rêvebirin.

**Ahrar Al Sharqiyah**

Ev koma çeteyên hov ji aliyê Tirkiye û Ewropayê ve hatiye avakirin. Ev koma ku di warê siyasî û rêxistinî de bi Birayên Misilman (Îxwan) ve girêdayî ye, di warê leşkerî de girêdayi El Nûsra ye. Wek navend xwera bajarê Dêrezorê hilbijartibûn. Koma çete ya Ceyş El Şerqiye ku di serî de di nava El Nûsra de cih digirt, ji El Nûsra derket û beriya sala 2016’an avakirina xwe ragihand.

**Kiryarên şer yê ji aliyê vê koma çete ve hatine kirin**

Ev kom herêmên di bin bandora xwe de talan dike, sivîlan dikuje, direvîne û bi darê zorê koçber dike. Weke ku li Efrîn, Serêkaniyê û Girêspî di heman demê de vê komên çete dagirkeriya bajarên weke Heleb, Şehba û Til Rifet jî cihgirtin. Li ser gelê sivîl komkujî kirin û erdê wan talan kirin, agir bi darên zeytûnan û deverên daristanî yên gundên Efrînê dan, mal û erdên sivîlan talan kirin û bi qaçaxî derbasî El Raî, Bab û Cerablûsê kirin. Bi êrişên li ser Minbicê jî tê payin ev komên çete tevlî bûne.

**Sûltan Mûrad**

Pêdiviyên lojîstîk û leşkerî yên vê koma ku piraniya wan Tirkmenên ku li Sûriyê jiyan dikin pêktên, ji aliyê dewleta Tirk ve tê dabînkirin û perwerdeya wan jî ji aliyê dewleta Tirk ve tê kirin. Ev kom di heman demê de koma herî mezin a çeteyên Tirkmen a Sûriyê ye.
Koma çete ya Sûltan Mûrad ji aliyê MÎT’ê ve bi komkirina komên çete yên Fatîh Sûltan Mehmet, Zekî Turkmenî û Eşbel El Akide yên li Helebê di bin heman sîwanê de hat avakirin. Piştî komên çete yên Fatîh Sultan Mehmet, çeteyên Zekî Turkmenî û Eşbel El Akide, komên din ên çeteyên Tirkmen, Şehîdên Tirkmen, El Ewel Muşat, Meham Elase û El Yarmuk jî ragihandin ku tevlî çeteyên Sultan Murad bûne. Di rêveberiya çeteyên Sûltan Mûrad ên ku di Adara 2013’an de hatibûn ragihandin de 3 nav hene. Rêveberê giştî yê çeteyan Yûsif El Salih, rêveberê qadê Fehîm Îsa û berpirsyarê leşkerî Ehmed Osman.

**Kiryarên çeteyên Sûltan Mûrad**

Têkiliyên çeteyên Sûltan Mûrad bi çeteyên Heyet Tehrîr El Şam (berê El Nûsra) yên ku li Idlib û Helebê çalak in û çeteyên DAIŞ’ê yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji aliyê QSD’ê ve hatin têkbirin jî di nav de ne.
Kiryarên şer ji aliyê çeteyên Sûltan Mûrad ve hatin kirin. Vê komê di sala 2016’an de bi piştgiriya hewayî û bejayî êrîşî bajarê Kesseb kir. Koma çeteyên ku bajar û gundên we talan kirin, bi hezaran Ermenî bi darê zorê koçber kirin Ev koma ku di êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li ser Sûriyeyê de cih digire, li Efrîn, Ezaz û li dijî sivîlan bi taybet gelê Kurd komkujî, revandin û talankirina sivîlan heye. Êrişa dawî ya li ser Heleb û Şehba jî cihgirtine.

**Cebhet El-Şamiyê**

Ev koma çete ya ku bi piranî li Helebê tevdigere, komeke çete ya mezin e ku li Bakurê Sûriyeyê tevdigere. Koma navborî Nûreddîn El Zenkî, El Mucehidîn, Cebhe El Îslamiye, Cemaeta Fisteqêm Kema Umert, Cebhe El Esala ve El-Tenmiye, Harekat Hezim, Sikur El Şam, Ensar El Îslam, El Heq, El Îslam Ordu, Feylak El Şam in. û yên din ji yekîtiya gelek komên çete yên di bin heman sîwanê de pêktên.

**Heyet Tehrîr El-Şam**

Tehrîr El-Şam (HTŞ) di sala 2017’an de bi yekbûna El Nûsra, DAIŞ’ê û hin komên din yên çete hate avakirin. HTŞ ku hewildan kir, serweriya xwe beşek ji axa Bakurê Rojavayê Sûriyê bike, û armanc dike ku bi rûxandina hikûmeta Şamê û têkbirina Beşer Esed pêkbîn e. Avakirina dewleteke îslamî ya sunnî li şûna wê, weke yek ji komên çete yên girêdayî El Qaîdeyê, hêza xwe zêde bike. HTS ji damezrandina xwe ve gelek hemwelatiyên Amerîkî dîl girtine. HTŞ, hêmaneke tundrew ku ji opozisyona Sûrî cuda ye, berdewam e bi pileyên cihêreng bandora xwe li ser hikûmeta xwecihî û komployên biyanî dike. HTŞ qaşo li gor zagonên dewleta Tirk ya dagirker di listeya terorê deye, lê bi şêwazekî çalak tevlî êrîşên dagirkeriyê ya li ser Helebê û Şehba bûn. Her çi qas dabin xuyakirin ku, êrîşê li ser herêmê Kurdan nakin jî, lê kiryarên wan li ser bajarên weke Serêkaniyê û Efrînê hatin temaşe kirin.



**DAIŞ**

Çeteyên DAIŞ’ê ew komek çete ku di êrişên li ser bajarên Mûsil ya Iraq û Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê cih girtiye. 2014’an Şengal û Kobanê qirkirin û jenosîd li dîjî gelê Kurdên Ezîdî pêkanîn. Koma ku di salên ewil ên Şerê Iraqê de hat avakirin û di sala 2004’an de piştgiriya xwe bi çeteyên bi navê El Qaîdeyê re ragihand, piştî demekê navê El-Qaîde li Iraqê girt. Kom bi giştî ji civakên Sunnî û komên cuda, wekî Meclîsa Şûra ya Mucahidîn, El-Qaîde, Ceyş El-Fetihîn, Cund el-Sehaba, Katbiyan Ensar El-Tewhîd wel Sunneh, Ceish al-Taiifa al-Mensûra pêk tê. Armanca wî ew e ku xîlafetê li herêmên ku hejmara wan a Sunnî li Iraq û Şamê zêde ye, ava bike. Di Sibata 2014’an de, piştî şerekî dirêj ê 8 mehan ê desthilatdariyê, El Qaîde ragihand ku hemû têkiliyên xwe bi DAIŞ’ê re qut kirine. Di sala 2019’an de QSD’ê ragihand ku çeteyên DAIŞ’ê di aliyê çekdarî de hatiye qedandin. Kampa Holê gelek malbatên çeteyên DAIŞ’ê bi cîh digirin. Gelek caran hêzên Evlekariya Hûndirûn di dijî wan çeteyan operasyon pêktîne. Gelek şaneyên weşartî bajarên weke Reqa, Dêrezor, Tebqa û Minbicê hene. Piştî têkçûyina çeteyên DAIŞ’ê li Rojavayê Kurdistanê gelek çete revîyan çûn Tirkiyê. Êrîşên dagirkeriyê yên li hemberî Tevgera Azadiyê û gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê der, bi çalak dinav komên çeteyên din de cîh digirtin. Êrişên li ser Heleb û Şehba jî çeteyên DAIŞ’ê bi dîmen hatin teqezkirin.

# Sûriya û dagirkeriya Tirk

**Mihemed Seydi**

Rêjîma Baas hilweşiya û her alî qale çawaniya pêşeroja Sûriyê dike. Lê dewleta Tirk ji wan aliyan e ku ne pêşeroja Sûriyê lê belê ji bo wê bêparhiştina Kurdan ji pêşeroja Sûriyê dixebite. Lewma dema ku komên çekdar ên di bin navê Odeya Operasyonan de berê xwe didan Şamê, dewleta Tirk dest bi êrişên li ser herêmên di bin serweriya QSD’ê de kir. Destpêkê herêmên Şehbayê rastî êrişa çeteyên dewleta Tirk hatin û ji bo xelkê Efrînê yên koçber rastî komkujiyeke bi destê van çeteyan neyên, QSD’ê biryar da wan ji wê derê veguhezîne herêmên Rojhilatê Firatê. Ev yek jî bi koordîneya bi Odeya Operasyonê ya Opozisyona çekdarî re pêk hat ku Heleb û derdora wê êdî ji destê hêzên Rêjîmê derketibû û ji aliyê wan ve hatibû kontrolkirin.
Her wiha dema rêjîma Baas hilweşiya û Şam ket destê Opozisyona çekdarî, vê carê dewleta Tirk û çeteyên wê êrişî Minbicê kir û li derdora wê çend komkujî derheqê endamên saziyên xizmetê de pêk anîn. Hemû siloganên van çeteyan silogonên dewleta Tirk û DAIŞ’ê bûn ku digotin ev kafir in û divê werin kuştin. Her wiha li Sûriyê kî dostaniya Kurdan dike bi navê PKK û Qendîl bi nav dikin û kuştina wan helal dibînin. Ev jî siyaseta dewleta Tirk e ku kîjan kurd qale mafê xwe bike, wî bi terorist bi nav dike û bi terorê kurdan û dostên wan qetil dike. Her wiha derdikevin li ser ekranan jî dibêjin, ew ne li dijî kurdan in lê ew li dijî kurdên PKK’î ne. Her wiha bi hinek pere ev gotinên xwe bi hin kesên Ereb jî didin gotin.
Disa dema Rêjîm li Şamê ket û agahiya ku Beşar El-Esed reviya ye belav bû, dewleta Tirk hin kesên kirêgirtî li Reqqa û li Dêrazorê xistin tevgerê û bi riya tevna civakî û ragihandinê dest bi fitneyê di nava kurd û ereban de kir. Êrişî Rêveberiya Xweser kirin û gotin ku çima Kurd li herêmên erebî serweriyê dikin û divê derkevin, lê erebên di nava rêveberiyê de derketin û gotin ku ew di nava rêveberiyê de cih digrin û temsîla ereban dikin. Vê carê Propagandeya vaye QSD’ê dixwaze Sûriyê parçe bike kirin û bi vê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tevlihevî derxistin. Hinek kesên kirêgirtî dîsa li Reqqayê xistin nava milet û fîşek li milet reşandin û xistin stuyê endamên Asayişê, lê dîmen belav bûn û xuya bû kê ew sivîl gulebaran kiriye.
Li aliyê din, Meclisa Gelan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi biryara hildana Ala Sûriyê ya serxwebûnê li rex ya Rêveberiya Xweser, gavek avêt ku dewleta Tirk hesabê wê nekiribû û bi vê, plana wê ya derxistina fitnê pûç kir. Ne Dewleta Tirk û çeteyên wê û ne jî nijadperestên Ereb ên Baasî ku li pêyî derxistina fitnê di nava Kurd û Ereban de ne da Rêveberiyê jî reş bikin, li ben da tevgereke wiha bûn. Lewma ev biryara hildana ala Sûriyê ya serxwebûnê li rex ya Rêveberiyê bi gava “Kiş Melêk” di listika şetrenc de hat bi navkirin.
Êdî sînorên xwezayî yên Rêveberiya Xweser ku QSD’ê diparêze bûne çemê Firatê. Vekşîna ji Minbicê jî wer xuyaye di çarçoveya lihevhatinekê de pêk hatiye ku DYA beşek ji wê ye lê heta niha detayên wê nehatine eşkerekirin. Qale avakirina hikumeta nû û nivîsandina destûrê Sûriyê di dema pêş de jî tê kirin, lê ji bo vê, dem pêwîste û hîne ne diyar e wê rewşa Sûriyê ber bi ku ve diçe. Ji ber çend sebeban ku ji wan jî dagirkirina axa Sûryê ji aliyê dewleta Tirk ve ye, hebûna DAIŞ’ê li Sûriyê û tevgera Îran û bermahiyên BAAS ku wê bi çûyîna xwe jî xelkê Sûriyê rihet nehêlin.